# … Û GAVEK JÎ LI SER R’ÊYA BERBI AŞTÎYÊ Û CIVAKA DÊMOKRATÎK VA

Ezîz ê Cewo

## Hinek pêşdîrok

Pêvajoya “Aştîî û Civaka Demokratîk”, a ku bi banga r’êberê gelê k’urd r’êzdar Ocalan destpê bûye, hema di sêrî da bala r’aya giştî, siyastmetmederên cuda, r’ayedarên dewletan û sazî-r’êxistinên navnet’ewî, zanîyar, r’ojnameger û lêk’olîneran veger’andye ser xwe.

Her t’erefek, heya her mirovek – k’urd, ne k’urd – ev pêvajo bi awayekî şopandye, û hinekan ew wek dîtina xwe nirxandine, hinekan jî ew wisa r’ave û şirove kirine, wek ku wan xwestye wê bibînin. Û hê jî dîtinên cihêr’eng dertên holê. Û ev jî xwezayî ye, wek ku tê gotin: “Çiqas mirov – ewqas dîtin û nêr’în!” Lêbelê, nêr’în û dîtin li hêlekê, r’astîyek li holê heye, ya ku divê mirov bibîne, û ew jî ev e: *erê, evê pêvajoyê hê negîhandye bi praktîkî pêkanîna guhar’tinan, lê ew ji bo wan guhar’tinan bingehekê amade dike, di têgihîştina pirsê da gelek tişt hatine guhar’tin, heya r’ayedarên p’ayebilind ên desthilatê jî bi nîvme-tirsî-nîvwêrekî ji bo hinek bûyerên dijmirovî li xwe mukur’ hatine…*

Û di konfêransa da jî, r’êyên cihêr’eng ên çareserîya pirsgirêkan hatine govtûgokirin…

Helbet, me jî hema di destpêkê da pêvajo şopandye, û di derbarê wê da r’êzegotarên me bi nirxandin, dîtin û şiroveyan va hatine weşandin. Jêderkên wan di dawîya gotara berî vê da hene, ya ku di bin sernivîsa “Vê carê Civîna giştî ya R’êxistina Net’ewên Yekbûyî mirovahî matma hişt” da hatye weşandin[1].

Lewra jî, dema ji bo beşdarbûna konferansa navnet’ewî ya “Aştîî û Civaka Demokratîk” ji Partîya DEM-ê vexwendinname ji me r’a hat, ji hêlekê va hestên dilxweşîyê û spasdarîyê di dilê me da r’û dan, ji hêla dinê va agirê baldarîya lêger’înan di nava me da gur’ bû, ku vê carê emê bikaribim pêvajoyê, ne ku bi şêweywkî dûreke, lê jinêzîkva bişopînin...

Û, weha, 5-ê berfanbarê em li Stenbolê ne, 6-7-ê mehê dê konfêransa dîrokî pêk bê!

## ... Konfêrans!



**K’omek beşdar û amadek’arên konfêransê – piştî danîştinê…**

Belê, bi înîtsîatîva Partîya DEM-ê 6 – 7-ê berfanbara sala 2025-an li Stenbolê konferansa navnet’ewî ya “Aştîî û Civaka Demokratîk” pêk hat. Ji 19 welatên 5 p’arzemînên Cîhanê bi dehan siyasetmedar, zanîyar, r’ojnameger, p’arêzvanên mafên mirovan û nûnerên

[1] https://www.amidakurd.net/ku/tekst/VE_CARE_CIVI_NA_GIS_TI_YA_R_E_XISTINA_NET_EWE_N_YEKBU_YI_MIROVAHI_MATMA_HIS_T

parlamentoyan hatibûn wir, ji bo ku beşdarî vê konfêransa asta bilind bibin, bi dehan syasetmeder, r'ojnameger, zanîyar û çalakvan jî ji K'omara T'irkîyayê û Bakûrê K'urdistanê amade bûn. Lê r'êzek kesayetî, yên ku ji ber sedemên cuda nikaribûn bên Stenbolê, ji Ewropayê û welatên dinê bi dûreke, bi r'êya vîdêoyê beşdarî konfêransê bûn. Hevseroka Daîreya K'arên Derva ya Herêma Xweser a Bakûr-R'ojhilatê Sûrîyayê Îlham Ehmed jî di vê r'êzê da ji R'ojavayê K'urdistanê bi vîdoyê beşdar bû. Nûnerên ji Başûrê K'urdistanê hatî p'eyamên r'êvebirîyên PDK, YNK û Herêma otonom a K'urdistanê pêşk'êş kirin ...

Di konfêransê da li ser pirsgirêkan bi awayekî şênber hate govtûgokirin. Û di encamê da daxwez û pêşnîyara hemûyan ew bû, *ku divê ev şer' û p'evçûn bi r'êyên siyasî, bi dîalog bên ç'areserkirin, ku ji bo vê pêvajoyê Abdulah Ocalan xwedî r'oleke girîng e, û ji bo ku aştî û aramî bê T'irkîyayê, K'urdistanê û herêma R'ojhilata Navîn, Ew divê azad be! ...*

Jixwe di derbarê konfêransê da ji hêla têlêvîzîonan va bernameyên cuda hatine amadekirin û pêşk'êşkirin, di weşanên cuda da nirxandinên cihêr'eng pêk hatine, lewra jî, ji bo ku li vira wan hemûyan dubare nekin, emê her encamên ku ji gengeşîyên Konfêransê derk'etine û di Encamnameya wê da cîh girtine, li vir bînin. Weha, ew:

1. Wek ku di biryara Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê da jî hatiye diyarkirin, em rêziknameyên zagonî yên ku Mafê Hêviyê nas dikin û azadiya Ocalan gengaz dikin, ji bo aştiyeke bi rûmet wek merc dibînin. Heta Mafê Hêviyê bê cihanîn, divê têkiliyên zanîyar û rewşenbîran bi Ocalan ra bên misogerkirin û ji bo ku her kes bikaribe ji berhemên wî yên bîrewarî sûdê wergire, divê derfet bên afirandin. Divê Girava Îmraliyê li şûna sembola goşangîrîyê bibe deriyekî aştîyê û pêşerojeke azad ji bo Tirkiyeyê. Divê hemû şert û mercên Îmraliyê yên goşangîrîyê ji bin va bên rakirin.

2. Em bawer dikin, ku divê şer û pevçûn bi rêbazên siyasî bên rawestandin, rêya here guncan ji bo destanîna aştiyeke mayînde dîalog û danûstandin in. Em diyar dikin, ku, li gorî biryara 1325-an a Konseya Ewlehiyê ya Netewên Yekbûyî, divê jin di danûstandinên aştiyê û pêvajoyên çareserkirina şêr da roleke çalaktir bilîzin.

3. Em nêrîna Abdullah Ocalan a di wê derbarê da dipejirînin, ku modela netew-dewlet newekhevîya civakî, serdestiya li ser bingeha zayendî û wêrankirina jîngehê kûrtir dike, û girîngiya pêşxistina wan modelan dupat dikin, ên ku ji bo jinan beşdariya wekhev garantî dikin, demokrasîya herêmî xurt dikin û piştgiriyê didin hevjiyana aştiyane ya civakên cuda.

4. Wek ku di ezmûnên çareserkirina şerên li çar aliyên cîhanê da jî tê xuyan, bi awayekî lezgîn pêdivî bi veguherîna qanûnî heye. Di vê çarçoveyê da, em bawer dikin, ku Tirkîye pêdivî bi peymaneke civakî ya nû a demokratîk heye, a ku hemû gel, bawerî û nasnameyan li ser bingeha hemwelatîbûna wekhev bihewîne. Peymaneke civakî, ya ku tu beşekî civakê derveyî wan mafan nehîle, dê di Tirkiyeyê da bi tevahî tundûtûjiyê ji holê rake.

5. Wek ku di mînakên Başûrê Afrîkayê, Îrlandayê, Baskê û Katalonyayê da hatiye xuyan, û ew di konferansê da hatine govtûgokirin, divê rêbazên hişk û navendî, yên ku dibin sedema pevçûnan, bi wan rêbazan bên werguhartin, ên ku yekîtiya civakî misoger dikin û tundûtûjiyê ji holê radikin. Divê modelên rêveberiya herêmî li Tirkiyeyê hem li ser asta siyasî, hem jî li ser asta civakî bên govtûgokirin. Em diyar dikin, ku di çarçoveya van govtûgoyan da divê qanûnên wisa bên derxistin, ên ku rêveberiyên herêmî xurt bikin.

6. Em helwesta erênî ya Parlamentoya Ewropayê destnîşan dikin, lêbelê, ew divê roleke çalaktir û hîn çêker bilîze. Bi bawerîya me, eger pêwîst be, bi hevdengîya hemû aliyan, Yekîtiya Ewropayê dikare wek navbeynkar, an garantor beşdarî pêvajoya aştiyê bibe.

Ji bo pêşeroja aştiyê û veguherîna demokratîk, a ku li Tirkiyeyê destpê bûye, here sêrî, di sêrî da azadiya Abdullah Ocalan û girtiyên ji doza Kobaniyê û hemû girtiyên siyasî, di çarç'oveya qanûna aştiyê da, ne qenciyek, an terefgirtinek e, ev pêdiviyeke dîrokî û qanûnî ye. Goşangîrîya giran, a ku ji bîst û şeş salan zêdetir e, hatiye ferzkirin, bi qanûnên netewî û navnetewî ra li hev nake. Em bang li Tirkiyeyê dikin, ku ew li gorî erkên xwe yên di warê mafên mirovan û hiqûqa mirovane da tevbigere.

Em vê beyannameyê wek gaveke dîrokî ya berbi aştiyeke mayînde va dibînin û bang li hemû aliyan dikin, ku berpirsiyarîyên xwe cîh bînin. Emê pêşveçûnên pêvajoyê bişopînin û hêviya xwe ya ji bo veguherîneke berbi civaka demokratîk a berfireh va bi biryardarî bipa-rêzin.

**Beşdarên "Konferansa Aştîîyê û Civaka Demokratîk a Navnetewî"**
**Stenbol, 11-ê ber-fanbara 2025-an.**

Û ev encam, ên ku ji vê Kunfêransa navnet'ewêî derk'etine, ji bilî ku dê bi r'êya çapemenîyê, r'adîo-têlêvîzîonan û medya civakî bigihîjin r'aya giştî, dê wisa jî her'in ber destê r'ayedarên p'êwendîdar ên sazî û r'êxistinê navnet'ewî û dewletên cîhanê. Ew dê li ser astên cuda bên govtûgokirin, nirxandin û wat'edarkirin. K'a, gelo, piştî vê sazî û dezgehên p'êwendîdar dê bigihîjin çi bir'yaran, ew t'erefekî pirsê ye, lê wisa jî girîng e, ku di derbarê r'ewşa gelê k'urd da dê di nava r'aya giştî da dîtineke obyêktîv çê bibe û di derbarê r'êyên ç'areserîya pirsgirêkên T'irkîyayê û t'evahîya herêmê da têgihîştineke giştî derk'eve holê...

Ev pêvajoyek e!

Û di vê çarç'oveyê da di Konfêransê da axivîna me jî pêk hat.




Di vê derbarê da jî, helbet, di çapemenîyê da hinek agahî derk'etine.[2] Lê, ji ber ku her p'ergalrke çapemenîyê çarç'oveyên xwe yên weşanê hene, ew nikarin hemû axavtinan bi t'evahîya xwe va biweşînin, emê li vira xalên sereke yên wê axavtinê ji bo xwendevanan p'arvebikim.

Weha, ew:

– Pirsgirêka k'urdî ne pirsa ewlek'arîya dewletekê ye, ew mafekî hûmanîtar e, ê mirovî ye. Ew mafekî xwezayî yê hemû gelan e, ê ku bi Tûzika R'êxistina Net'ewên yekbûyî jî hatye misogerkirin.

– K'urdistan mêtîngeheke navnet'ewî ye, ne ji ber wê, ku di nava çar dewletên herêmê da hatye çarparç'ekirin, lê ji ber wê, ku ew dewletana jî ji hêla xwe va bi dewletên gewre yên derva va girêdayîne – mêtîngehên wan dewletane.

– Ocaln girtî û r'ehîneyê T'irkîyayê nîne, ew girtî û r'ehîneyê navdewletî ye, lewra jî dewletên gewre divê di pirsa azadîya r'êberê gelê k'urd da bersîvdarîya xwe têbigihîjin û berpirsyarîya xwe cîh bînin.

– Gelê ku nexwaze bimire, hîç kesek nikare wî bikuje.

– Gelê ku di cîhanê da ewqas dost û dilxwazên wî hebin, kesekê nikaribe wî têk bibe.

– Pirseke balk'êş jî! Dewlet Baxçelî gotye, ku Ocalan muxat'abê wan ê ciddî ye... Ma, gelo, mirovek, ê ku di girtîgehê da wek r'ehîne hatibe girtin, dê bikaribe muxat'abê wan be? Eger ew mux'tabê wan e, wê demê divê r'izgar bibe, weke wan azad be, û r'êxistinên û sazîyên navnet'ewî yên t'endurustîp'arêz divê r'ewşa wî ya t'endurustîyê kontrol bikin, bînin cîh, ji bo ku ew bikaribe r'êvebirîya pêvejoyê pêk bîne. Azadîya Ocalan ne t'enê ji bo ç'are-

[2] https://youtu.be/_n-QM8F1NSE?si=ME6eTxdHQM-Zr0CF ; https://russian.anf-news.com/news/Azize-Dzevo-svoboda-Odzalana-eto-svoboda-kurdskogo-naroda-i-narodov-Bliznego-Vostoka-70452

serîya pirsgirêka k'urdî girîng e, bi wê wisa jî pirsgirêkên T'irkîyayê bi xwe dê bên ç'areserkirin. T'irkîyaê bi xwe jî ji gelek gendelî, xiravî û nep'akîyan r'izgar bibe.

Lewra jî, azadîya gelê k'urd û ya t'evahîya gelên herêmê p'abendî azadîya Ocalan e.

– Û piştî wê, dema ev dur'ûtîya tê kirin, nayê têgihîştin, dema Baxçelî di destpêkê da bang dike, dibêje – bila Ocalan bê, di Meclîsê da biaxive, – bang bike, ku mafê hêvîyê heye, lê paşê wan gotinên xwe jibîrdike... Û îro jî dewa çekdanînê û tiştên dinê tên kirin.

R'êxistinê hema di destpêkê da gotye: *"Erê, me kongrêya xwe pêkanye û bir'yar jî girtine, lêbelê, ji bo ku ew bir'yarana bên pêkanîn, dewlet divê gavan biavêje"*.

Ji xwe di banga R'êber Ocalan a destpêkê da jî hatye gotin: *"Sedsala k'omarê ya duyemîn t'enê wê demê dikare bibe xwedî yekîtî û berdewamîyeke mayînde, dema ku bi dêmokrasî bê t'acîdarkirin"*[3]. – Û ev gotin hema di destpêka Daxwîyanîyê da hene, lê hinek vê naxwînin, her t'enê pirsa xwebetalkirina PKK-ê didin pêş.

Ango hema di destpêkê da merc hatine danîn, lê desthilat wan mercan pêk nayne...

– Lêbelê, hinek tiştên erênî jî derk'etine holê, yên ku ji hêla me – k'urdan va nayên k'aranîn. Binihêr'in, Erdoxan bi xwe bi zarê xwe gotye, ku ev destûra bingehîn a komarê ya dema derbeyê ye...

Û ji bilî axavtin û gotarên beşdaran, di çarç'oveya Konfêransê da wisa jî hevdîtin û govtûgoyên cuda pêk hatin, ên ku paşê k'etin bingeha dîtina hevbeş a beşdarên konfêransê.

Belê, ev konfêrans jî p'arç'eyekî Pêvajoyê ye, û encamên ku ji wê derk'etine jî, li ber ç'avan in...

Helbet, mirovê bixwesta, ku pirsgirêk di zûtirîn demê da bê ç'areserkirin, û aştî û aramî bê herêmê. Lê, gelo, ev çiqasî r'êal e? Ev dewlet li ser bingeha destûrekê hatye avakirin, a ku ç'avkanîya xwe ji *"net'ewperestîya At'at'ûrk"* digire (ev ne gotinên me ne, ên Destûra bingehîn a KT ne!), ya ku hemû hemwelatîyên k'omarê t'irk dibîne û ji bilî zimanê t'irkî zimanên dinê yên pêkhatîyên vê dewletê qedexe dike.[4] Lewra jî, heya ev destûra heye, di vî welatî da guhar'tinên r'êal nikarin pêk bên. Ji ber vê jî, divê ji bo van guhar'tinan di nava civakê da – ji jêr heya jorê – guhar'tinên heşbîrî (zîhnyetî) pêk bên. Evê jî, hema ev pêvajoya dikare pêk bîne.

Bala xwe bidinê, berê dikaribû di serê k'ê r'a derbaz dibûya, ku r'ojekê serokk'omarê T'irkîyê dê r'abe û li xwemukur' bê, ku di welatê wan da dewletê li hember gelê k'urd *"şaşîyên sîyasî"* (bixwîne: *sûc!*) pêkanîne. Û wan *"şaşîyan"* ew weha r'êz dike: *kuştin û bê şop windakirina k'urdan ji hêla dewletê va, yên ku kiryarên wan hê jî nehatine diyarkirin, bûyerên ku di zîndana Dîyarbek'irê da pêkhatine, gundên ku ji hêla dewletê va hatine şewitandin, mirovên ku di nava şevekê da hatine k'oçberkirin, dayîkên ku nikaribûne di girtîgehan da li gel zar'okên xwe bi k'urdî biaxivin!*

Ew wisa jî li xwe mukur' tê, ku *ji sala 1984-an û vir va her hukumetek a T'irkîyayê hatye û gotye – emê PKK têk bibin, – lê ji wan r'a li hev nehatye, û ew çûne...* Ku *wan di nava 40 salên derbasbûyî da dît, k'a çiqasî zehmet e, ku bi destûra bingehîn a darbek'aran civak bibe yek* ... Ku *T'irkiye êdî bi destûra bingehîn a darbek'aran nikare berbi siber'ojê ve bimeşe. Êdî pêwîstî bi destûreke bingehîn a sivîlan heye, ne ya darbek'a-ran"*.[5]

Wisa jî, gelo k'ê dikaribû xiyal bikira, ku Dewlet Baxçelîyê bibêje – Ocalan muxtabê herî ciddî ye! Ku gelek siyasedmederên dewletê yên berê û îro dê bê tirs vekirî bibêjin, ku ew amade ne, her'in girava Îmralîyê û bi r'êberê gelê k'urd Ocalan r'a hevdîtinan pêk bînin...

Û encamek a girîng a vê Pêvajoyê jî ew e, ku bi wê dest bi pêvajoya pêkhatina Yekîtîya

---

[3] Bi hûrbînî – li vira ye: https://www.amidakurd.net/ku/tekst/P%C3%8AVAJO_R_AST%C3%8EY%C3%8AN_D%C3%8EROK%C3%8E_DERDIXE_HOL%C3%8A

[4] Di vê derbarê da di nasîya 1-em da binihêr'in.

[5] Li nasîya 3-em binihêr'in!

net'ewî jî bûye! Ev encam in, ên ku divê mirov bibîne, pêvajoyê bi baldarî bişopîne û bi sebir gav bi gav pêşva bibe.

Ev r'ewş di r'ojekê da negihîştye û dê di r'ojekê da jî ç'areser nebe. Ji bo vê pêdivî bi bi sebir û bi bir'yardarî pêşvebirina vî k'arî heye...

Erê, r'ayedarên desthilatê dê evê pêvajoyê wek xwe şêwazdar û nav bikin, lêbelê r'astî-yek li holê ye, ev pêvajo dimeşe û guhar'tinên heşbîrî (zîhnyetî) bi xwe r'a tîne ...

Pêvajoyê bi xwe ra têgihîştinek derxistye holê: *ji bo ku di vê dewletê da guhar'tin pêk bên, peymaneke civakî (Destûra bingehîn) a nû pêwîst e, û, eger ev pêvajo bigihîne encameke weha, wê demê mirovê bikaribe bibêje – terk li qeşayê k'et û pêşîya avê vebû!*

A, ya ku divê bê têgihîştin û pêk bê jî, hema ev e!

Lewra jî, di vê serdemê da hemû hêz û derfetên me, wek net'ew, divê ar'asteyî vê armancê bibin!

Û daxwez û erênîya r'oja îro jî hema ev e!

Helbet, ev t'erefekî pêşk'evtianên vê serdemê ye, ya ku dikare û divê her'e sêrî, eger di vê pêvajoyê da sazî û r'êxistinên medenî yên K'omarê bi xwe jî beşdarî wê bibin û piştgirî-yê bidin pêşk'evtinan, eger hêzên navdewletî ji bo vê r'ewşê bersîvdarîya xwe têbigihîjin, bip'ejirînin û berpirsîyarîyên xwe cîh bînin.

Û di vê r'ewşê da daxwîyanîyên r'ayedarên AKP-ê û dewletê yên di wê derbarê da, ku ew vê pêvajoyê wek a ji bo T'irkîyake bê têr'or dibînin, pirsa efûyê (t'eslîmyetê) derdixin pêş, di nava gel da metirsîyekê derdixin û dibin sedema gengeşî û govtûgoyên cuda.

Di vê derbarê da me êdî nêr'îna xwe nivîsye, ku, *eger di T'irkîyayê da têr'orek heye, ew jî ya dewletê ye li hember welatîyên xwe, û t'evgera k'urd jî r'êxistinek a antîtêror a navnet'ewî ye. Û ev yek jî di praktîkê da piştar'st bûye: kê pişta DAÎŞ-ê şkênand, kê piştgirî daye DAÎŞ-ê? – Li ber ç'avan e, PKK-ê li dijî têr'ora DAÎŞ-ê têk'oşya, lê hukumeta AKP piştgirî da wê, ji bo wê siyasetmeder û sivîl girtin û avîtin girtîgaehan, ji ber ku wan bi sembolîk piştgirîya têk'oşîna li dijî têr'orê kirine! – Doza Kobanîyê tê bîra we?*

Bi vê boneyê me di dema xwe da behsa Dadgeha Nyûrinbêrgê kiribû û pêşnîyar kiribû, ku dewletên gewre û r'êxistinên navnet'ewî dagehek a wî r'engî ya navnet'ewî damezirînin û r'êvebirên K'omara T'irkîyayê îro û duh ji bo sûcên dijmirovî, yên ku wan li dijî gelê k'urd û t'evahîya gelên wî welatî pêkanîne, darizînin!

Naha, wek ku tê xuyan, bi vê pêvajoê r'a dikaribûn agahîyên ku me berê jî di gotar-nirxandinên xwe da anîbûn, û yên nû, yên ku bi vê pêvajoyê r'a derk'etine holê (gotinên r'a-yedarên K'omara T'irkîyê bi xwe – wek ît'iraf/xwemukur'hatin), li cîhekî bihatana t'omar-kirin, bi dadwerîyê va bihatina şêwazdarkirin û bigîhandana ber destê sazîyên p'êwendîdar ên R'êxistina Net'ewên Yekbûyî, bi daxweza ku dadgeheke navnetewî bê damezirandin, ya ku wan sûcan bi dadwerî binirxîne, wat'edar û qîmet bike û anegorî wan bir'yaran bigire.

… Her çiqas, hinek dewletan "piştgirîya" xwe ji bo r'êjîma K'T'-ê dane xuyan jî, di dadgehên cuda yên navnet'ewî da li dijî wê gelek doz hatine vekirin – ji bo sûcên wê (ci-nayet!) yên cuda û binp'êkirina mafên mirov ji hêla wê va. Û ji wan dozan gelek hatine qazenckirin, hinek jî hê di pêvajoya lêpirsînê da ne.

Lê hîç xema T'irkîyayê nîne, lewra ku xwedîyên wê yên bi hêz û bandor û hinek sazî û r'êxistinên navnet'ewî yên cuda hene, yên ku amade ne, di xizmeta wê da bin …

Lêbelê, cîhan tê veguhar'tin. Bi gavne biç'ûk û hêdî, … lê tê veguhar'tin. Û gelê k'urd jî bi têk'oşîna xwe ya mafdar û r'ewa k'eda xwe dike nava van veguhar'tinan.

Û agahîyek a balk'êş jî, ji bo wê, eger R'NY biryara damezirandina dadgeheke navne-t'ewî, an komîsîonekê bigire: dozgera berê ya Dadgeha navnet'ewî (*International Tribunal*) ya R'êxistina Net'ewên Yekbûyî (R'NY/UN) ***Kar'la dêl Pontê*** cotmeha sala 2019-an bang kiribû, ku Erdoxan di Dadgeha Haagayê da darizînin. Di banga wê da bi t'aybet dihat gotin: ***"Erdoxan xaka Sûrîyayê dager kirye, ji bo ku k'urdan t'une bike. Ev nayê p'ejirandin!***

***Divê li hemberî wî lêpirsîn bê destpêkirin. Erdoxan divê ji bo pêkanîna sûcên leşkerî bê darizandin. Divê destûr neyê dayîn, ku ew ji wî r'a bimîne. K 'urdên Sûrîyayê û T'irkîyayê di bin t'ehdîd û metirsîyên ciddî yên r'êjîma Ankarayê da ne".***

Û ya here girîng! Dadgeha bilind a bir'yarguyêr' a Bêlgîyayê 28-ê r'êbendana sala 2020-î di Brûksêlê (Paytexta NATO-yê!) da bir'yara Dadgeha venêr'înê ya adara sala 2019-an a di wê derbarê da erê kirye, ku ***Partîya K'arkerên K'urdistanê r'êxistineke têr'orîstî nayê hejmartin, lê wek t'erefekî p'evçûnên ç'ekdarî tê dîtin.*** Jixwe du hevtîyan berî vê biryarê serdozgerê Dadgeha biryarguhêr êdî nêr'îna xwe ya erênî di vê derbarê da gotibûye.[6]

Jixwe, PKK-ê jî, hê sîh sal berê (24.01.1995) Peymana Jênêvayê (The Geneva Convention) ya di derbarê p'arastina mafên mirovan a di demên p'evçûnên ç'ekdarî da – leşker, hêsîrên şêr', yên birîndar û kesên medenî, îmze kirye, û di wê derbarê da li Jênêvayê di civîna çapemanîyê da r'agîhandye. Û ew jî wê demê, dema r'êjîma T'irkîyayê hîç r'êzik û pîvanek a sazî, r'êxistin û peymaneke navnet'ewî ne dişopîne û ne jî cîh tîne.

Û li vira pirs dertê holê: Ew sazî û r'êxistinên navnet'ewî, û di serî da jî R'êxistina Net'ewên Yekbûyî, yên ku divê cîhanîna merc û pîvanên vê daxwîyanîyê bişopandana û, dema ku pêwîst bikira, desttêwerdanek pêk bianyana, li k'u bûn û îro li k'u ne?[7]

Wek ku li jorê jî hate gotin, divê di bin sîwana R'êxistina Net'ewên Yekbûyî (R'NY) da, wek garantîya vê pêvajoyê, ji kesayetîyên  mafap'arêz, dadzan, civaknas û siyasetzan komîsîonek a navnet'ewî bê avakirin, a ku sedem û bingehên obyêktîv û sûbyêktîv ên vî şer'î – di nava wan da wisa jî agahî û daneyên di derbarê sûcên r'êjîma K'T' a îroyîn, bi dîrokî û dadwerî binirxîne, encamên wê r'adestî dadgeha navnet'ewî bike, ya ku bersîvdarên (bixwîne – sûck'arên!) vê r'ewşê li ser bingeha wan agahî dane û delîlên berdest darizîne, û r'ê û r'êbazên ç'areserîya wan nak'okîyan bibîne, yên ku dibin sedemê şer' û p'evçûnan...

Wek garantîya vê pêvajoyê!

An – na, kesek nizne, k'a k'îjan k'om û hêz dê di T'irkîyayê da bixwazin vê pêvajoyê sabote bikin! Ma ne, ewna çi navî jî li xwe bikin, hemû jî berhemên wê sîstêma dijmirovî pêk hatine, a ku li ser bingeha net'ewp'erestîya At'at'ûrk a destûrî hatye avakirin û di wê da metirsîya derbek'arîyê xwe telandye.

Û nîşanên wê jî li vir û wir êdî xwe didin xuyan!...

Gelê k'urd û T'evgera Net'ewî dê her tiştê ku ji destê wan tên, bikin, ku pirsgirêk, wek ku r'êber Ocalan destnîşan kirye, bi r'ê û r'êbazên aştyane û siyasî bên ç'areserkirin, lê wisa jî, ji bo her şêwazekî pêşketinan amade ne.

## Amed!

... Piştî Konfêransê me – k'omek beşdarên wê daxwezîya xwe dîyar kir, ku serlêdana p'ayt'exta K'urdistanê – Ameda kevnar bikin.

Û 8-ê berfanbarê k'oma me bi balafir'ê fir'î Amedê.

Ew k'om ji van 6 kesan pêk dihat: *Xosê Êstarrona Êlîzando (Josu Estarrona Elizondo)* – sênator, ji Baskê; *Con Hollowêy (John Holloway)* –Profêsorê Zanîngeha sotsîologîyê ya bajarê  Pûêblê yê Mêk'sîkayê, hevdamezirînêrê Akadêmîya  navnet'ewî ya zanistên civakî; *Anîl Prasad Hêgdê* (Aneel Prasad Hegde) — parlamênter, ji Hindistanê; *Danîêlla Pattî (Daniella Patti)* – hevseroka Partîya Volte, ji Îtalîyayê; *Dildar Kaya* – Înîtsîatîva Xelata Nobêlê ji bo Jinan (Nobel Woman's Initiative), ji Almanîyayê û ez – Ezîz ê Cewo –zimanzan, lêger'îner û r'ojnameger, ji R'ûsîyayê.

Li Amedê nûnera GSBB-ê – Yekîtîya şaredarîyan R'ûken Demîrer, Nivîsk'ar, hevserokê Komîsîona ziman, çand û hunerê ya Partîya DEM-ê Heval Dilbahar û nûnerekî Şaredarîya Amedê yê bi navê Mehmed jî (ê ku werger pêk tanî) gihîştin me.

[6]https://www. amidakurd.net/ku/tekst/R_OJEVA_K_URDÎ_YA_CÎHANÊ_PÊVAJOYA_AŞTÎYÊ_Û_PÊŞK_E VTINÊN_SÛRÎYAYÊ

[7] https://www.amidakurd.net/ku/tekst/P%C3%8AVAJO_R_AST%C3%8E Y%C3%8AN_D%C3%8EROK%C3%8E_DERDIXE_HOL%C3%8A

R’ojeva me p’ir’ dagirtî bû: piştî em gihîştin Amedê, êdî di şaredarîya bajêr da li benda me bûn, piştî du sehetan hevserokên şaredarîyê di bifir’yana P’arîzê...

Piştra em çûn navenda t’evgera jinan û Yekîtîya şaredarîyan... Em çûn Sûrê, me xwest her’in Mûzêya ark’olojîyê ya Amedê, lê li ber kontrolê nobedaran em r’awestandin, nehîştin her’in, gotin, ku ew girêdayê walîtîyê ye, destûra wan pêwîste, qey bibêjî em dixwazin herin baregeha hêzêên ewlek’arîya komarê, ne ku sazîya çandî-dîrokî ya Amedê. Hema wê demê k’omek a zar’okên dibistanê, hat bê xem û astengî derbazî hindur’ bû. Wê demê hat ber heşê min: ev berendamên bişavtinê ne, dema heya dawîyê mejûyê wan bişon, dê hemû derî li ber wan vekirîbin! ... Gelo di derbarê peyk’erên arxêlojîk yên K’urdistanê da dê ji van zar’okan ra çi bibêjin, gelo...

Em hilkişyan ser bedena kevnar a Amedê. Wê r’ojê mij hebû, lê ji çar hîlan va Amed ji jorva heya cîhekî dihat xuyan, paşê di nava mjê da betreng dibû û di nava mijê da dihelya...



**Di wêne da:** *Xosê Êstarrona Êlîzando, Con Hollowêy, Heval Dilbahar, Ezîz ê Cewo, Anîl Prasad Hêgdê, Danîêlla Pattî, R’ûken Demîrer, Mehmed û Dildar Kaya.*



Sibetirê em çûn R’ihayê / Xerabr’eşkê / Girê mirazan. Ew yek ji peyk’erên ark’êolojîk yên dîroka mirovahîyê yê herî kevnar e – p’erestgehek e, t’emenê wê digije derdorê 12000 salan.

Kesên ku bala wan bik’işîne, ew dikarin di derbarê vî peykarî da di gotara Xerzî Xerzan a bi sernivîsa “Xerabreşk: Perestgeha here kevnar a cîhanê” da bxwînin[8]

Dema em gihîştin Gola masîyan, êdî tarîyê erd hilç’inîbû. Di bin r’onahîya lembeyan da me bi baldarîyeke mezin bêhempetîya vî peyk’erê dîrokî jî nihêr’î. Heya min bi t’êlêfona xwe çend wêne jî k’işandin, lê çawanîya wan ne baş bû...

Bi gotinekê, eger em bibêjin, ku em ji Amedê t’êr bûn, dê ne r’ast be. Ewqasî me bêhan wê k’işand – bêhna hewa wê, bêhna kevirên wê, bêhna dîroka wê, bêhna berxwedana wê,

---

[8] https://dirokurd.blogspot.com/2017/12/xerabresk-perestgeha-heri-kevnar-cihane.html?m=1; her weha: https://en.wikipedia.org/wiki/Göbekli_Tepe an https://ru.wikipedia.org/wiki/Гёбекли-Тепе

bêhna mijê wê... Me ava wê vexwar, bi amedîyan r'a axivîn, û em t'î veger'yan...

Dibe ku paşê, bi boneyeke dinê em tiştekî di derbarê Amedê da binivîsin, dibe ku veger'in van r'ojan. Lê ev seredana bû sedem, ku em careke dinê du gotarên xwe yên dinê yên bi sernivîsa "Hemû r'ê dibin Amedê" bixwînim û bi hestên îro wan r'ojan jnûva wat'edar bikim. Û li ser vê notê ez wan bi dilxweşî pêşnîyarî bala xwendevanên hêja jî dikim[9]...

**P.N.**



Dema ev gotar êdî ji bo weşanê amede bû, di çapemenîyê da di wê derbarê da agahî hat belavkirin, ku dema maça k'omên fûtbolê alîgirên Bursosporê ku bi nijadp'erestî û êrişk'ariya xwe tên zanîn, li ser trîbûnên stadîonê dijûn û gotinên bêr'êzîyê li siyasetmedara k'urd a navdar Leyla Zana kirine...

Bi dîtina me, divê mirov evê bûyerê bi hestyarî nenirxîne.

Ev êlêmêntana (mirov nikare, wana wek mirov û kes nav bke!) ç'êlikên vê sîstêmê ne, ya ku li ser bingeha net'ewperestîya At'at'ûrk a wê destûra bingehîn pêk hatine û p'erwerde bûne, ya ku Erdoxan behsa wê kirye.

Evan ç'êlikên vê sîstêmê ne!

Lewra jî divê mirov hewl bide, bizanibe, çima wana hema berê xwe dan Leyla Zana?

Erê, Leyla Zana kesayetîyek a hêja û siyasetmederek a navdar e, ew yek ji sembolên berxwedana gelê k'urd e di qada siyasî da û ji hêla gelê xwe va hatye û tê hezkirin!

Lêbelê, pirs dertê holê – çima hema naha – di dema vê pêvajoyê da û Leyla Zana!

Ya ku divê em, wek net'ew, têbigihîjin, hema ev e!

Lê, di vê r'ewşê da, ya ku divê bê zanîn, Leyla Zana ne t'enê ye – gelê wê yê berxwedêr û T'evgera net'ewî hene, û em hemû dê bi hevr'a vê p'êlê jî derbaz bikin.

Û li vira bi vê boneyê çend gotinên wat'edar ên di cîhanê da dîyar tên bîra mirov:

– Eger se diewt'e, bizanibe, tiştek heye!

– Se diewt'e hîvê jî!

– Se diewt'e, lê kerwan dimeşe!

---

Pyatîgorsk/R'ûsîya
15–20.12.2025.

[9] https://www.amidakurd.net/ku/tekst/wê_demê_amedê_ji_me_r_a_çi_got û https://www.amidakurd.net/ku/tekst/wê_demê_amedê_ji_me_r_a_çi_got_2